Qet te ji bîr nakem!

Kakşar Oremar
Email: kakshar_oremar@yahoo.de

Wek Destpêk…
Dema em behsa mirovheziya kesekî/ê dikin, du tişt hene ku kesayetiya mirova radixin ber çava:

1. Dan-standin û xisletên mirovahiyê yên taybetî.
2. Cesaret û berpirsyartiya exlaqî-wijdanî ku kerameta mirovan dixemlîne.

Kesên wiha tenê ne yên xwe ne, belkî bi fikir û ramanên xwe malê hemû civaka cihana mezinin. Ew bi qasî cihana mezin bi kar û exlaqê xwe jêhatî û mezinin. Cihanbînîya wan pir berfireh û cesareta insanbûna wan bûye sedem ku mekteba demokrasîyê sal bi sal mezintir û rengê mukemeltir bixwe bigire. Wan bi ked û xwîna xwe hemû êş û elemên jiyanê pejirandin, lê qebul nekirin ku **„bihayê insaniyetê“** bê xwarê an jî kêm bibe. Reş, spî, Arî, Samî, Tirk, Ereb, Ingilîz, Kurd û bi serhev da **„insan“** tev ji wan ra mîna hev in. Du ji wan kesên ku ketin ser vê rêya pîroz, bo me mînakên dîrokî ne: Prof. Îsmaîl Beşêkçî û Dr. Sçopenhauers ku yek ket pey xizmeta ji bo doza Kurdistanê û yê din jî çantê xwe hilanî û berê xwe da welatên Afrîka û heya mirinê ji feqîr û hejaran ra bû dost, êş û derdên wan jî derman dikirin.
Ew insanên mukemel bûn û cihana îro ger heye bi xêra wan li ser piya maye.
Di jiyana min da yekî wiha rastî min jî hat ku armanca wî ya herî mezin guherandina zêhniyeta civakê bû. Ev armanc jî xwedî felsefe û cewherekî kûr bû. Yanî çêkirina şoreşeke hemû alî di Kurdistan û hemû cîhanê da. Navê wî Sefkan(Celal Ercan) bû. Em demeke kurt bi hev ra bûn, lê di wê dema kurt da min di xwîndigeha wî da dersên mezin standin.

Rewşa wan salan

Havîna sala 1984an bû. Agirê şerê di navbera Îran û Îraqê da germ û gor bû. Şerê di navbera her du KDPyên Îran û Îraqê da jî mixabin her dera rojhelatê Kurdistanê xistibû bin bandora xwe ya nigatîv. Bi şerê her du dewletên dagîrker ra derfetên dîrokî ji Kurdan ra çêbibîn, lê li cihê bikaranîna van derfetên zêrîn, mixabin şerê birakujiyê bibû sedem ku nasyonalîstên Ereb û Ecem bi eşkerahî

bêjin:**" ferqa seyê reşê û spî nîne, bila hevdu bikujin, çi ba bê çi baran, ji omrê berfê diçe."**

Di rewşeke wiha da hatina çend endamên PKKê bo herêma Urmiyê di nava raya giştî da bibû mizgîniyeke xêrê û fikreke nû di civakê da afirandibû. Wan bi şev û roj di nava Kurdên başûr û rojhelatê Kurdistanê da li dijî şerê birakujiyê propagande dikirin. Gelek Kurd li wira hebûn û bi fîta neyaran amade bûn ku bera sernîzeyên xwe bidene singê hev, lê bi xêra hevala zû pêhesiyan ku hêzên Kurda yên siyasî ketine davka dewletên dagîrker û bûne darê destê wan!. Wiha bû ku riheke biratiyê û hevgirtinê di navbera Kurdên du parçên Kurdistanê da çêbû. Ev rih roj bi roj bihêztir dibû û di dawiyê da bû hêzeke mezin û bandora xwe ya pozîtîv li ser paşeroja qedera xelkê jî danî. Ger heval nebûna belkî şer di navbera penaberên Kurd û Kurdên xwe cih da jî çêdibû.

Naskirina hunermemd Sefkan

Hingî du bargehên hevala li herêma Mirgever hebûn. Yek li gundê Rajan û ya din jî li gundê Zêwe. Bargeha Zêwe di bin berpirsyartiya hevalekî da bû ku jêra digotin Ehmed(Aktaş). Rojekê wî bi rêya birayê min xeber da ku biçim cem wan. Ez ji Urmiyê çûm wira. Hevalê Ehmed yek ji wan kesên destpêkê bû ku bi dîsplîn û zehmetiyên mezin li ser şiyarkirina ciwanên Kurd disekinî. Wê rojê ji min ra got:**" Hevalekî me ji Ewropa hatiye û li ser karê hunerê dixebite. Navê wî Sefkan e û niha li gundê Rajanê ye. Here wira û wî bixwe ra bîne vira. Daxwaza me ji te ewe ku bi wîra li gunda bigerî û bibî cem dengbêjên herêmê. Ew dixwaze li ser kilamên Kurdî lêkolînekê bike û wan binivîse...".**

Ez çûm Rajanê û min li wira hevalê Sefkan dît. Em bi hevra hatin Zêwe û hema ji roja din me dest bi karê xwe kir.

Sefkan xortekî bejin bilind û gelek jî axaftin xweş bû. Mîna artîstên sînemayê hate ber çavên min. Carna nedikarî daxwazên xwe bi Kurdîyeke rewan beyan bike û zû bi zimakê Tirkî bi hevalên derdora xwe ra dişiwirî daku daxwaza xwe bi hevalên din ra bide fêm kirin. Mirovekî şirîn bû, di tona dengê wî da cidiyeteke ecayêb hebû û zû mirov neçar dikir ku li ser tiştên ku diaxive, mirov biçe nava fikir û ramanên kûr. Pirs li pey pirsa din ji zimanê wî dibarîn, lê mixabin min nedikarî bi awayekî bersivên pirsên wî bidem ku têhnatiya wî bişkêne. Min ev rastî di çavên wî da didît. Hemû gotinên wî ji mera nû bûn û bi taybetî jî di qada hunera Kurdî da wî em hînî tiştên nû dikirin. Li ser hunermendên Kurda yên kilasîk xwedî nêrînên gelek nû bû. Dema Hesen Cizîrî strana "Kevok im" digot, Sefkan mest û mendehoşê dengê wî dibû. Hertim wiha digot:**" Hunermendên mîna Hesen Cizîrî tunene û ez hunera wî ji ya**

Mihemed Arif bilindtir dibînim..." û dikete nava şiroveyên zanistî li ser deng û hunera Kurdî ku hingî famkirina wan ji kesekî weke min ra giran bû. Em çûn cem çend dengbêjên herêmê, hêşta wan devê xwe venekirî, Sefkan jî qelem û kaxez derdixistin û dest bi nivîsandina gotin û stranên wan dikir. Peyvên ku fam nedikirin, min jêra şirove dikirin an jî dengbêja bixwe naveroka kilam û stranên xwe jêra îzah dikirin. Hingî hevalê hunermend Sefkan çend defter ji kilamên Kurdî yên herêma Urmiyê tejî kirin, lê nizanim ew defter piştî şehîdbûna wî çi lêhatin!!. Gelo şandin Ewropa an jî dema şehîd bû di çantê wî da bûn û ketin destê wan cinayetkarên ku bi bêbextî li hemberî wan kemîn danîbûn?!
Sefkan bi hezeke mezin guhdarî wan kalên Kurd yên çîrokbêj dikir ku li ser çîroka Kela Dim-dim, Xec û Siyamend, Mem û Zîn û hwd diaxivîn. Rojekê ji min daxwaza kir ku wî hînî xwîndina bi tîpên Erebî bikem. Me dest pêkir û di heftiyekê da wî karî hêdî-hêdî Kurdiya bi rênivîsa Erebî jî bixwîne. Ji min daxwaz kir ku xwe hînî xwîndin-nivîsandina rênivîsa Latînî bikem. Wî bi dilsoziyeke mezin hemû tîp û dengên di rênivîsa Kurdî ya bi tîpên Latînî li ser rûpelekî mezin ji min ra nivîsîn. Her roj ku me dest bi karê xwe dikir, ji min dawa dikir ku tiştên ew dinivîse, li cem wî bixwînim. Min wiha dest bi xwîndina pirtûkên Latînî kir.
Heval Sefkan bi evîneke germ li ser karê xwe disekinî û heta xebata xwe negehanda encamekê, mandîbûn nas nedikir.

Sefkan û Hunerkom

Sefkan dema ji Ewropa hatibû behsa damezrandina **„Hunerkom“**ê**(Yekîtiya Hunermendên Welatparêzên Kurdistanê)** dikir. Ew bixwe yek ji damezrînerên wê bû. Nizanim kovara **Serxwebûn** bû an **Berxwedan** ku xebera sazbûna Hunerkomê bi fotoyekî weşandibû. Sefkan bi kenekê ku hezar hîvî têda bûn, ew xeber ji me ra dixwend û behsa armancên xwe yên paşerojê dikir. Du kasêt li cem bûn ku yek **"Koma Berxwedan 1"** bû û ya din jî **"Stranên Kurdî yên Kilasîk"** bûn ku têda dengê Hesen Cizîrî, Nesrîn Şêrwan, Eyşe Şan û çend hunermendên din yên Kurd hebû. Hingî gelek behsa hinek endamên Hunerkomê dikir ku navê Zozan, Emele û Mizgînê baş tê bîra min. Çend fotoyên wî û „Mizgîn“ê bi hevra hebûn ku min gelek cara dawa lêkir kopiyekê ji wan bide min, lê digot:**“ di nava rêxistina me da belavkirina fotoyên şexsî yasaxe û heta izina me tune em fotoya jî bikişinin..."**.

Fotoyek û Bîranînek…



Rojekê ez û ew çûbûn ser mezarê hevalekî şehîd ku li gorsitana gundê Melabasek(nêzî gundê Zêwe) hatibû veşartin. Di vegerê da em hatin gundê Zêwe û min jê daxwaz kir ku em bi hevra çend fotoyan li **"wênegiriya Zêwe"** bigirin, lê wî qebûl nekir û dîsa jî bi bîra min anî ku nikare serpêçiyê ji zagonên partiya xwe bike. Lê ji cizdana xwe wêneyekî xwe yê rengîn derxist û li ser pişta wî nivîsî:**" Pêşkêş ji hevalê Kakşar re..."** Ew wêne hêşta jî li cem min maye û heta mirinê jî yê li cem min bimîne.

Qîmeta Dengbêja li ba Sefkan

Sefkan bi hemû hissên xwe hunermend bû. Wênekêşekî şehreza bû. Gelek cara li ser bergên rojname û kovarên partiyê(PKK) hinek karên xwe nîşanî min didan, lê qet nedigot kê kişandine!. Tenê naverok û mesja wan tabloyan ji min ra şirov dikir. Piştî çendîn sala hunermend Emele ji min ra eşkera kir ku ew tablo piranî yên wî bixwe bûn. Carna bi saz û dengê xwe dîwana me germ dikir, lê di hizûra dengbêja da qet stran nedigotin. Hingî gelek cara min jê rica dikir ku ew jî bistre, lê digot:**" dengbêjî xwedî qanûn û qirarên xwe yên taybetîye. Dengbêj xwedî qîmeteke mezinin û ez iznê nadem xwe ku li cem wan bistirin, ew hem bi temen û hem jî bi hunera xwe ji min mezintirin..."**

SERXWEBÛN

Kürdistan'da devrim yangını büyüyor

Uluslararası zor güçleri de bu yangını söndüremeyecek

Bi van gotinan wî meirîfet û sewiya rewşenbîriya xwe ji me tevan ra îspat dikir. Şoreşgerekî bi pirensîp bû û em tev di bin bandora kiryar û gotinên wî da mabûn.

Sefkanê me yê jîr û zana hingî behsa hinek dengbêjên Kurda dikir û felsefa hunera wan ji mera îzah dikir ku navê wan ji mera xerîb bû. Şiroveyên wî wisa pirbar û heta dikarim bêjim zanistî bûn ku di mêşikê me da nedigûncîn. Çimkî heya hingî me ji zimanê hunermendekî tiştên wiha balkêş nebihîstibûn.

Sefkan xwedî armancên gelek pîroz û mezin bû. Hezar hîvîyên wî hebûn. Wateya mandîbûnê nedizanî. Dema sibê zû ji xewê radibû wiha digot:**" axxx...**

çi hewayekî xweş û sirûştiye. Wî hewayê Ewropa mala me xera kir. Vira cennete heval... ceneta hemû dinê ye...".
Bi van gotinên wî em bêtir dibûne evîndarên doza Kurdistanê û ziman û çanda me bêtir li xweşa me dihat.

Şehîdkirina Sefkan!

Bihara sala 1985an xebera şehîdbûna heval Sefkan bi rêya hevalê Salih û Ehmed gehişt me. Mala me li bajarê Tebrêzê bû û heval bo seredanekê hatibûn cem me. Dema di kovara Serxwebûn da min wêneyên Sefkan û hevalên wî dît, dinya li ber çavên min reş bû. Min nedixwest bawer bikem ku mirovekî wiha mezin hema wiha rihet û hêsan serî bibe nava axa sar. Min dizanî ka ew bi hêz û evîneke çiqas mezin rojên jiyana xwe tejî dike. Çiqas bi serkeftina Kurda û qedereke tejî serfirazî hîvîdar bû. Dema li ser jenusîda Dêrsimê diaxivî, hemû hez û hestên xwe yêm mirovheziyê radixistin ber çava. Li ser sîstema Kemalîzimê û fermanên ku artêşa Tirkiyê li bakurê Kurdistanê çêkiribûn, geh bi gotin ji me ra diaxivî û geh jî stran li ser dibarandin. Dema çûbû Xakûrkê jî li ser hunera Kurdî û jenusîda Dêrsimê ya sala 1938an ji hevalan ra tiştekî mîna semînar dabû. Ew gotin an jî semînara wî di kovara Serxwebûn û Berxwedan da hatibû weşandin.

Çima şehîd bû?!

Lê gelo Sefkan û hevalên xwe çima şehîd bûn û sedem çi bûn!??.
Beriya hatina PKKê me nedizanî Sosyalîzim çiye û armancên wê çine. Hevalan evîna Kurdayetiyê û sosyalîzma real gehandibûn hev. Ev rêç û rêbaza ku di nava civaka Kurdistanê da munaqişeke nû afirandibnû li xweşa komonîstên kilasîk nediçû. Di munaqişe û axaftinên dîwanî da jî nedikarîn bi hevalên PKKê ra biaxivin. Roj bi roj stêrka wan kêmronahîtir û stêrka hevala jî di qada xebata ji Kurdistanê ra geştir dibû. Êdî ew ketin wê fikrê ku bi kuştinê rê li ber wendabûna xwe bigirin û nehêlin PKK di kar û çalakiyên xwe da zêdetir pêş bikeve. Gel di rêbaza her du aliyan da ferqên mezin dîtibûn. Exlaq, fîdakarî, zaniyarî, hurmeta bilinda ji bo jinê û gelek xalên din yên pozîtîv di kar û xebata hevalan da bibûn sedem ku her Kurdek deriyê dil û mala xwe ji wan ra vekirî bihêle. Û karekî wiha bû sedem ku "Partiya Şuîyên(komonîsta) Kurdistanê" dest bi cinayeteke wiha mezin bike. Sefkan û çend hevalên xwe koma yekê bûn ku li ser axa başûrê Kurdistanê bi komployeke wiha nemerdane şehîd bûn.

Heyf zû çû!

Ez di wê baweriyê da me ku ger Sefkan heya roja îro sax bûya, niha rewşa hunera Kurda ya protestoyê di astekî bilindtir da bû. Saziyên me yê mezintir û xwedî berhemên baştir bûna, lê heyf wan bêbextên çav sor hunermendê jîr û zana Sefkan di bihara temenê xwe da ji nava me qetandin. Mixabin ew zû çû, lê qêrîn û pêşbînîyên wî bûn rastî û vaye gel li ser piyaye.
Berpirsên Tev-Çandê bi minasibeta 25mîn salroja şehîdbûna heval Sefkan merasimeke bîranînê çêkirin. Tevî hemû kêmasiyan ev pêngaveke gelek baş û di cihê xwe daye. Çimkî em çiqas qîmeta mîrasê xwe bigirin, hêşat jî kême.

Ez soz didem te hevalê şehîd, serkêşê hunermendên şehîd, Sefkanê dengxweş û hunermend ku qet te ji bîr nekem. Ezê bêtir li ser huner û jiyana te ya tejî hîvî û heza ji bo azadiya Kurdistanê binivîsim heval can…